Xêrî Bozanî

# Hêlameve

Helbest



Hêlameve "Helbest"
Xêrî Bozanî

Montêv:
Cemîl Mehemed Sebrî

Derhênana Hunerî Çapa Nurmal:
Mehemedê Mela Hemdî

Derhênana Hunerî Çapa Dicital:
Hekar Findî

Ji Weşanên Malpera Amûdê
Navenda Çanda Kurdî
Jimare : 17

Malpera Amûdê 12/2002
www.amude.com
info@amude.com

Hemû maf parastîne bo helbestvanî û
Malpera Amûdê

Bo:
Ewên
ji
Jîn
û
Jana
Têr-
nebûyn

# Hindik lê rindik

Ev berevoka Xêrê Bozanî, ji bîst hilbesta pêkhatiye, bûna berevokekî belkî bîst hilbest hindikin. Lê ev jî bese ku tu bi şoreta xweyê van helbesta bibî nas û hêjatiya van nivîsaran bibînî.

Xêrî Bozanî kirye ku nivîsarên wî rengê hilbesta nû, ya himdemî bistînin. Wê yekê ez bi taybetî li forma wana dibînim. Rêzên poyetîk wî şikênandine ne bi carekî bi du sê cara. Rêz zêdetir bûne, ropelên pirtokê dagirtine bi dîtina min bûna xwandevana forma van hilbesta zêde giring nîne. Dewra wana divê berevokêda kême. Hilbestên Xêrî Bozanî bala xwandevana dikêşînin ser xwe bi nazkaya vehûnandina rêza, bi naveroka xwe her bend- xan, her hilbest hestekî evînîyê ye.

Rewş- hesteke taybetîye, ku li ruh û canê hilbestvanî ve hatiye alandin. Xêrî Bozanî hesta xwe me ferznake, nejî bi



meve girêdide, ew serbixweye, ew hesta hilbestvane, lê gava tu dixûnî, hesta wî ji tera xerîb namîne, tu jî pêra dikelî, difikirî, di êşî, şad dibî, pêra dibî heval.

Eve giringe, ji ber ku hilbestvan bi hunera xwe ya nivîsarvanîyê te bê teref nahêle, tu rex gotinên wîve bê deng derbaz nabî.

Şoreta hilbestvanîyê rêberê Xêrî Bozanî ye, ew hilbestvanekî xweyî fikre, şarezayî xezîna peyvên zimanê Kurdîye.


Gelo pêgirtina wî bi hilbesta û hilbestvanîyê wê çiqasî dom bike, dîrokê nîşan bide?

Hîvîya min heye ku ew rê wê dirêj û bi rûnekibe.

Dexwazeka min jî heye ku ew li ser vê rîya bi rûmet zimanê nivîsarê xwe ji dereca devoka herêmî rake, bigihîne ciwaniya zimanê Kurdî edebîyatê, ciwanî, ku îro di sedan pirtukanda bi bejin û bala xwe ber me radiweste û meşa xweya pêşveçûnîyê roj bi roj xort dike.

Tu ser çava ra bêyî Xêrî Bozanî.

**Celîlê Celîl**



# Can û Hozan



Min nevêt ava Hêwanê,
Dê vexom rondikên canê,
Nevêm kêşana hozanê,
Dê vehûnim kezîyên canê.

Ger delala xo nebînim,
Hozanê qet navehînim,
Kewên ribad nahewînim,
Her rondika dê barînim.

Peyva canê xoş hozane,
Di gel peyva min karwane,
Bo birînê ew dermane,
Ye bi evîne û pirr ramane.


Demê mila dihejînî,
Hozan bi xo tê vehînî,
Sed peyv û peyva diçînî,
Mêrga hozan pê di xemlînî.

**Boza -1986**

---

* Di rojnama (Bizav), hijmara (39)da, li 24.4.1990ê belav bûye.





# Bes xo giran ke

Tu ne peryeka esmanî,
Ne horîya li behiştanî,
Ne stêra berê sibanî,
Ne ciwantirî ji Le'lîxanê.

Ne heyva çarde şevanî,
Ne gula baxê siltanî,
Tu kîja dêlîz û xanî,
Bes xo giran ke nezanê.

Li evînê ne xudanî,
Bo birînê ne dermanî,
Min zanî tu nêçîrvanî,
Lewa nekeftim zîndanê.




Tu ne hinde ye giranî,
Dê sund xom bi wî Êzdanî,
Tu ne ji hêvênê Kurdanî,
bese nejî li Kurdistanê.

Tu ne ya hizr û bîranî,
Ne hejî kul û kovanî,
Çunkî bê soz û peymanî,
Ne hêjaya vê hozanê.

**Êsivnê-1989**

---

*** Di Rojnama "Hawkarî" da-Nîsana-1989 belavbûye.**



# Newroz û Seyran



Rabin hilken çirê jînê
Li nav tarî û tarîstanê,
Hilken agirê Newrozê
Li ser kopên Kurdistanê.
Dilê lawa îro geş ken
Bi sorîya rûkên canê,
Çavên xo hemû kilden
Bi tenîya agirê jiyanê.
Biken xoşî li vê beharê,
Dîlan û keyf û semyanê,
Ji bîr neken wî gernasî
Demê hûn diiçne seyranê.
Navê Kawey geş bilind ken
Di nav pesta û di gel stiranê.

**Boza-1986**




# Min nezanî



Çavên belek,
Pirça xelek,
Ez xapandim,
Gelek.. gelek..
Birho kivan
Awir û tîr li dilî dan
Min nezanî
Ew tîr dê bine jan û
Rojek dê êt û
Dilê min dê
Bite bi kovan
Gelek.. gelek
Min nezanî
Bo derdê min
Nabit Luqman û
Li birînê naket derman
Dilê min dê hêlit
Bo êş û jan û
Dê nalim
Gelek.. gelek

**Êsivnê-1989**



# Gehiştin



**-1-**

Rûh gurmijîn,
Lêv girnijîn,
Dil kenî û
Herdû çavên
Wek tenî
Rondik ji rûyên
Min mijîn.


**-2-**

Bi wê bejna zirav û
Rûkên bi xunav û
Bi berçemên
Dav.. dav
Hate cem min û
Kir silav,
Hizir û texmîn
Kirin belav,
Kirin belav.

**Êsivnê-1989**

---

* Di rojnama "Birayetî" li Nîsana 1992ê belavbûye.



# Newroz



**-1-**

Hêdî.. hêdî
Bejnek şepal
Li destî bûn
Cotek şemal
Digerîya
Li serê çiya
Li nav nehal.

**-2-**

Hate rasta gundê me
Çirîskên agirî,
Jê diweşyan û
Dikeftine nîva
Dilê me
Ca dilê me
Dişewitî,
Diperitî,
Digurmijî,
Dilerizî û
Dikeft,

-3-

Dişewitî-
Ta ku sax bîn
Diperitî-
Ta ku şiyar bîn
Dilerizî-
Da aza bîn û
Dikeft-
Ta ku rabîn.

**Boza-1987**

---

* Li rojnama "Kurdistanî Nuwê", hijmar 49 ya roja 21.3.1992ê belav bûye.





# Di xewa xo da

Di xewa xo da
Çome cihekî
Pirr bi êş û jan,
Hizr û bîrên
Di serê min da
Têk alozyan
Tirs û lerîz
Di dilê min da
Bûne mêvan,
Li vî alî
Xem û nalîn û
Ax û of,
Dilên bi keser
Leşên bê ser,
Pirr sehm û xof,
Li wî alî



Robarên sor û
Celad û hov.
- Erê bira:
Hêre doje?
- Nexêr bira:
Hêre cihê
Bêhinvedan û seyrangeha
Seroke!!!

**Boza-18. 3. 1988**



# Tirs




Tu dibêjî:
Evîn dil û cergê mine,
Şeng û hêza bejna mine,
Cihê dildara
Baxçê mine
Belê wan jî
Bi sîhra xo
Dinivînî û
Dikeysînî.
Tu dibêjî:
Hozan xûna leşê mine,
Aramgeha dilê mine,
Zimanhalê hizrên mine.
Belê wê jî
Dirêjînî û Pêka xo
pê Dixemlînî.
Tu dibêjî:
Xemrevînim,
Ezim dila dikewînim,
Belê paşî
Tu dikujî û

Dibirêjî
Dikelînî.
Tu dibêjî:
Baxçevana
Gulên sorim
Belê pa tu
Dixeniqînî û
Pelgên wana
Diwerînî û
Diçirmisînî.
Tu dizanî
Bo çî ditirsim?
Tirsa mine
Ji gotina teye
Demê dibêjî
Were di gel min
Bi dildarî
Bi evînî!!

**Êsivnê-1990**





# Hizrên rengîn

## Wênek

Ciwan bejneka
Zirav û ter
Çavreşeka
Dêm esmer
Kire xar.. û
Xo berda Nav
Gulên zer.

## Şikyat

Demê peyva min
Gehişte
Serê çiyayî
Ji bo şikyat
Yek bersiv jî
Bo min nehat
Min nezanî
Di gel mijê
Çoye rêya
Hat û nehat!



## Tirsa peyva

Demê min hizr û bîrên
Di serê xo da
Bi derzî û dezya vekirîn
Peyv lerizîn
Tirsyan neku
Serê wana
Bête birrîn!

## ......

Tu behayê
Gula nizanî
Çawa dê
Karî bifiroşî
Ey gulfiroş!

**Neçarî**

Min gote xema:
Ezî têrim!
Gotin:
Yan dê me xoy
Yan dê te xoyn!

......

- Çima tu li ser
Soza xo
Nemay û nehatî?
- Gote min:
Kengî te dîtîye
Bi şev
Roj hilatî?!





# Bihêle

Bihêle îro
Dilê xo wez
Bo te vekem,
Hemû ramanên
Evînê şirove kem,
Wênê te yê
Ciwan û rengîn
Nîşa te kem
Gerr tu vê jî
Di gel min nakey
Bes bihêle
Têr temaşay
Çavên te kem.

**Boza-1990**





# Kabûs

Hîvî dikem
Çi ca xo
Nîşa min neke,
Çavên min
Bi kirêtîya xo
Tarî neke,
Mûyên leşê min
Rawestyan,
Ewan dest û
Nênûkên bi xûn
Dûrî min ke.
Kê gotîye
Ez hij te dikem
Yan min tu divêy?!
Heta tu di xewnê dajî
Bihêy!!

**Boza-1988**





# Perîyek

Min dî zerîyek
Li ser banî
Nermebayê
Wê şev sibê
Lê dibanî,
Cotê hirmîya
Zîk rawestan
Li bin kirasê kitanî


Hêdî.. hêdî
Pêngav.. pêngav
Hate xwarê û
Cer hilîna
Ser milê xo û
Çowe kanîya pirrî av.



Demê gehişte
Ser hewda Û
xo çemand bû
Bi ser da
Ji min bir aqil û
Sewda,
Dilê min jî
Bersiv hew da.

Ev dîmene
Bûwe mêvan
Hemû şeva
Di xew da.

**Laliş- 1986**




# Ez û robar



- Ho robaro...
Çima wesa tûyî bi lezî,
Tirsa kê ye di dilê te da,
Hinde tu ji ber kê dibezî?
Yan xara te ji dînîyê ye
Ta bigehîye cotên kezî?
- Hozanvano
Ez natirsim,
Ezî xurtim û
Neyî dînim.
Leza mine
Ji kerb û xema
Ta bindestî û
Bê dengîyê
Bes bi çavên
Xo bibînim.

**Ba'edrê- 1987**




# Kengî?



Kengî destê min
Dê gehte
Serê kopê evînê?
Kengî dilê min
Dê qutit û
Ket şadî.
Bi levzet û
Tama jînê?
Kengî dê
Mem jî
Tam kete
Lêvên zînê?

**Boza-1987**



# Le dûrî to



To ezanî
Le dûrî to
Çî ekem?
Weku minal
Xom be wirde
Diyarîyekanit
Xerîk ekem.
Le ber şemal
Namekanit
Yeke.. yeke
Be ser ekem.
Lew kate da
Dûrî to
Bo maweyek
Le bîr ekem.

**Hewlêr-1994**



# Hêlameve




Careka dî
Hêlameve,
Ez û şeveke tarî,
Ez û dînî û harî,
Ez û xameke
Bi xem û
Momeke
Jîyê wê Yî
kurt û kem.
Hêlameve.
Ez û perrekî sipî û
Pirçeke sipî û
Pêkeke sipî

Hêlameve
Ez û nênûkên
Bê dengîyê û
Axînên bê hîvîyê.
Hêlameve
Careke dî
Bibime keysê
Çaverrênîyê.

**Boza-1991**

* Di heftînama "Peyman" hijmar 155 ya roja 15.4.1998ê belavbûye.





# Nehateve

Roj ava bû..
Pêlên tarîyê
Bilind dibûn û
Bi ser min da
Dihatine xwarê
Berê sibê
Careka dî
Di hilateve.

Belê heyva min
Hat girtin û
Kire tarî û
Bi daxwazên
Dost û yara,
Bi gazî û bakirin û hawara,
Bi denge.. deng û
Teqe.. teqa,
Careka dî
Bi ser min da
Nehateve!!



# Pênase

Hêvarekê
Gizîrê gundê me
Li ser banî
Deng hilanî:
Ho gundînoo..
Evê sibê
Li rêya darka
Werîsek
Ji xudanê wî
Keftîye.
Kê dîtîye?
Dengekî got:
Belê gizîr,
Bi xudê kem
Min dîtîye...




Min go: Gelo,
Ho xelkîno,
Ho xelkîno
Pênasa me
Ji me keftîye
Hinda bûye
Hûn bi udê ken
Kê dîtîye?
Kê dîtîye?
Ji tirsan da
Kesî nego
Kê birîye
Kê dizî ye!!

**Êsivnê-1989**

---

*** Di govara "Peyam" sala 1997, li Suwê belav bûye.**



# Ger dipirsî



Ger dipirsî
Ew çî deng bû,
Min guh lê bûy
Wesa dilê min geşkirî?
Dê bêjme te:
-Ew denge yê
Dengê dilê min bû.
Herdû rûkên
Ji nifşê Arî,
Herdû lêvên
Reng hinarî,
Sorîya nênûkên te jî
Ji xûna cergê min bû.
Rondikên zelal
Xunava terr
Areqa cotên sêva
Şeraba pêka min bû.

Zimanê min
Qelemeke û bi ramûsana
Ciwan peyvên
Nazik û terr
Dinivîsîn
Singê te jî perrê min bû.
Berê min
Her li xemla te bû
Demê diçoy û dihatî
Wekî gula ber bi roj.
Belê demê
Tu nedhatî.. nedhilatî
Pale gul jî di xema min bû!
Stêra li esmanan
Kire dîlan
Di nîva wan da
Heyva ciwan
Dileyizî
Ji bo covana
Me herdûka
Dikire semyan,



Ew şeve jî
Şeva min bû.
Guh li hîvîya
Nermebay bû
Dengekî xoş bigehtê,
Lêv li hîvîya
Tamekî bûn,
Ew jî tamê şerbetê
Nobedarên
Hatina te jî, çavên min bûn.
Ger dipirsî
Ew çî peyvin
Tu lêk tînî
Wesa dilê min dihejînî,
Dê bêjme te:
Ya guh lê bûy
Zimanhalê soza min bû.

**Boza-1990**

# Xokujî

Demjimêrê
Nîva şevê bi mira gehand
Kul û xema
Serê min
Ji vî alî
Bo vî alî
Dihijand.
Bi dilekî sar û
Bi bêdengîyeka
Wek ya şevê
Min xo nivand.
Çi bi bînim..?!
Min dî cîhan
Sera bine
Revîne... helatine
Tirse.. birse
Qelandine.
Li cîyekî dî
Habîlî qabîl
Di beêcand.



Êkî, li nav baxî
Sitrî diçand
Gul û giya jê
Dihilqand.
Hindekên dî
Şerefname
Didirrand.
Cizîrî û Nalî
Di behrên wanda
Dixeniqand.
Çi kabûse?
Çende bi tirse?
Areqeka tere sar
Bi leşê minda
Dihate xwar
Demjimêrê
Berê sibê
Bi minra Gehand.
Min dest havête Radyoyê û
Li ser pêla êmirkurta (75) ê
Min rawestand.

Sirûdeka şergêrîyê
Di hilhiland
Bêjerekî bi dengekî
Tîjî zurnayî
Mizgînîyeka xenayî
Şikestina birayên hev
Bi destên hev
Bi dijminên xora
Digehand,
Belê
Gehand.

**Hewlêr- 1994.**



## Supas bo:

- Bingehê Laliş yê Rewşenbîrî û komelayetî.
- Berêz: Mehemed Mela Hemdî.
  **Ji ber harîkarîya wan ya diravî.**

- Berêz: Sirwan Heci Berko.
  **ji ber weşandina vê pirtûkê di malpera amudê de .**

- Dr. Celîlê Celîl.
  **ji ber nivîsîna pêşgotinê.**

- Berêz: Cemîl Mehemed Sebrî.
  **ji ber nîgarkirina Montêfan.**

# Verist


| | |
|---|---|
| - Diyarî | 3 |
| - Hindik lê rindik | 5 |
| - Can û Hozan | 7 |
| - Bes xo giranke | 10 |
| - Newroz û seyran | 13 |
| - Min ne zanî | 15 |
| - Gehiştin | 17 |
| - Newroz | 19 |
| - Di xewa xoda | 22 |
| - Tirs | 25 |
| - Hizrên rengîn | 28 |
| - Bihêle | 32 |
| - Kabûs | 34 |
| - Perîyek | 36 |
| - Ez û robar | 39 |
| - Kengî | 41 |
| - Le dûrî to | 43 |
| - Hêlameve | 45 |
| - Nehate ve | 48 |
| - Pênase | 50 |
| - Ger di pirsî | 53 |
| - Xokujî | 57 |
| - Supasî | 62 |